

Gelo qet mesref çêdibin?

Na.

Ne pêwîst e ku tu ji bo alîkariya me, pera bidî.



Em rêzê ji biryara her jinê re digirin û di ber mafên wê de dixebitin.



www.frauenhorizonte.de

Têkilî û navnîşan

Telefon + 49 (0)761 285 85 85

24/7: Hûn dikarin her deqê û kêlî - her roj - her dema şevê, dawiya hefteyê û di rojên betlanê de bigihîjîn me

Bi Mail info@frauenhorizonte.de

Şêvirmendiyê online:

<https://frauenhorizonte.beranet.info/startseite.html>


Jivan bi girtin

Basler Str. 8, 79100 Freiburg

Demên xebatê yên buroyê:


Dûşem - Pêncşem seet 9.00 - 18.00 Uhr

În seet 9.00 - 13.00 Uhr



Bi tramwayê bi xeta 2, 3 - Halt Johanneskirche

Ev pela agahdariyê bi hevkarîya jinên penaber re hatîyê sazîkirin. Ev proje bi alîkariya van çêbûye:



Ji bo keç û jinan alîkarî û piştgirî

Hewcetiya te bi alîkariya heye?

Tu tê tengavkirin anjî zext û şideta cinsî li te tê kirin? Hewcetiya te bi hevalekê re heye ku tu pê re biaxivî? Em ji bo te li vê derê ne. Tu ne sûcdar î. Em wek xuşka te li pişt te ne, em şêwirmendî û hevkarîya te dikîn.

Hewcetiya te bi alîkariya lezgîn heye?

Heger êrişeke cinsî bê ser te, tu dikarî her kêlî xwe bigihîjî me.

Li FREIBURG e

Frauenhorizonte – Li dijî şideta cinsî

Telefon + 49 (0)761 285 85 85

Ji bo alîkariya li her dera Elmanyayê

TELEFONA ALÎKARIYE ji bo jinan ya li dijî şidetê û zextê

Tel +49 (0)8000 116 016

Hûn dikarin salê 365 rojan, her kêlî bê pere bigihîjin me: Telefona alîkariyê „Gewalt gegen Frauen (Şideta li dijî jinan)“ destpêkê ji kesên şidet li wan tê kirin, derfetan pêşkêş dike da ku ew xwe herdem bêyî navê xwe eşkere bikin, bi zîrekî, ewle, bê kelem û bi gelek zimanan ji xizmeta şêwrê sûdê wergirin.

Navê te dikare timî veşartî bimîne

Ji bo ku tu me ji pirsgirêken xwe agahdar bikî, ne girîng e ku tu navê xwe eşkere bikî. Em şêwirmendiya bi telefon û ya Online bi pêşkêş dikin û di rewşa lezgîn de her kêlî ji di xizmeta we de ne. Tu dikarî bi temamî nav veşartî bimînî, wê haya ti kesî ji telefonkirina te nebe. Li ser me ferz e ku em behs nekin, û em tenê tiştê tu bixwazî dikin. **Her tişt taybet û bi ewleb dimîne.**



Em ji Frauenhorizontê li dijî şideta cinsî – kine?

Em rêxistineke serbixwe ya ne ser bi dewletê ne li Freiburg'ê, em di xaniyekî starê yê tenê ji bo keçan û jinan de ne. Xebatkârên li cem me û yên di vî xaniyê de hemûjin in. Em alîkariya wan keş û jinan dikin ku bi şideta cinsî tîndarî bikin an li wan hatiye kirin.

Em çawa dikarin bi destê Frauenhorizonte alîkariya te bikin?

- Em di meseleyên li jêr de alîkariya te dikin.
- Ji aliyê psîkolojîk, ji bo aramiyê
- Em ji bo parastina te bi lezgînî li xaniyekî stara jinan digerin. Tu li wê derê jî bêyî ku navê xwe eşkere bikî, dimînî.
- Em bi te re diçin doktoran di dema muayeneyê de, em te li ser pêkanîna tiştan agahdar dikin û em li cem te ne
- Em di meseleyên hiqûqî de xizmeta şêwrê didin te
- Em bi te re diçin cemparêzereke jin
- Em alîkariya te di hemû pirsên hiqûqî de dikin, em şîreta li ser derfetên gilîkirinê dikin
- Em bi te re diçin doza ceza ya li dadgehê

Qanûn li pişt te ye – ne li pişt kesê sûcdar e.

Şideta cinsî her û her qedexe ye:

Li nava civakê, di malê de, li ser kar û li dibistanê.

